

Welat

01/06/2021

Çandî - Gîştî - Serbixwe

82

HAWAR

Qomela Kurdî • Revue Kurde

HEJMAR 1

15 GULAN 1398

Armanç, Ewagê Xebat û Nivîsandina Hawarê

15 GULANÊ

Roja Zimanê Kurdî

Ziman Hêmana Hebûna Gelan e

HAWAR

Qomela Kurdî • Revue Kurde

HEJMAR 1

15 GULAN 1398

QOMELA KURDÎ

1—Selahîya zarên qurdi û herberd-
anîn van. Selahî ser mîrwanîyê zimanê
qurdi digel zimanê din ên wî. Selahî
ser bişîrînê zimanê qurdi, ser dîroq û
maweyê rabîrê û pêşveçûna wî.

2—Her herqirina çîroq, çîgîroq û
her beşîlê leje û stranên qurdi û bişîr-
bêlêvîrîna van.

3—Sextadîn û belavqirîna dîroq
qurdi. Li van ve jî pêşveçûnê wî
mîrwanîyê bişîrînê jî de bîrê belav qirîn.

Zimanê me trê hem freh hem teng e.
Freh e: Pi her tîlê qo qurdi pî mî-
lêlê hîmê, dest dane van, di wî wî de
zimanê qurdi bişîrînê zimanê din û jî bişîr-
bêlê pîs ve çîşê, û qenîşîyê, û jî bişîr-
anînê qenîşîlê bişîrînê de ne çîrê.

Teng e: Her tîlê qo qurdi pî mîlêlê
mîrwanîyê qurdi pî mîlêlê, di wî wî
wî de ne çîşê, di wî wî de ne çîşê, di
wî wî de ne çîşê.

Li zimanê qurdi de her tîlê qo qurdi
pî mîlêlê, di wî wî de ne çîşê, di wî wî
de ne çîşê.



PEYVA WELAT

Gotineke Kurt Di Roja Zimanê Kurdî de

Desteya sernivîs

Bêguman, ji bo hebûna gelan, ziman hêmaneke sereke û bingehîn e, ew hebûna gel ya çandî û giyanî diparêze. Lê ji bo gelê bîndest û çewisandî, ziman deh taq girîngtir e.

Gelê kurd yek ji wan gelan e, ku bi dehê salan hewldanên qirkirin û bişaftina wî têne kirin. Yek ji alavên vê qirkirinê şerê zimanê kurdî bûye.

Zimanê kurdî di gelek qonaxên dijwar û zehmet re derbas bûye, ew rastî gelek astengiyan hatiye, gelek neheqî û ziyan lê hatiye kirin, lê tevî wilo jî dikarîbû li hemberî hemû zehmetiyan xwe biparêze. Kêm zêde wî dikarîbû zindî bimîne.

Xwedîderketina li vî zimanî ji hêla gelek camêran ve roleke pir mezin û pîroz di berdewamî û pêşketina wî de list. Ji Cezîrî û Xanî ta Celadet û Cegerxwîn û gelek destpakên dilsoz ên ku parastina ziman ji xwe re kirin derd û bareke netewî.

Qonaxa herî girîng û bi bandor ew bû dema ku endezyarê zimanê kurdî di serdema nûjen de mîr Celadet Bedurxan Hawara xwe derxist. Ev bi xwe şoreşeke zimanî ya gewre bûye.

Di 15ê gulana 1932an de hejmara yekem ji kovara Hawarê bi destê mîr Celadet hate derxistin. Rast e bi şeweyê xwe karekî ragihandinê bûye, lê di rastiya xwe de hîmeke asê û resen ji zimanê kurdî re bû. Mîr Celadet bi zanebûn û zîrekiya xwe ev kovar terxane kir bo belavkirina elfebeya kurdî ya latînî û rêzimana kurdî, bi vî awayî zimanê kurdî bi xurtî derbasî warê nivîsandinê kir û qonaxeke nû da destpêkirin. Lewra hêjaye ku ev roj bibe roja zimanê kurdî.

Îro roj, bi saya mîr celadet zimanê kurdî derbasî warê hînkirin û perwerdekirinê dibe û roj bi roj li pêş dikeve û bihêztir dibe.

Em dikarin bibêjin ku zimanê kurdî gavine pir mezin

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî



Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediye xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

ber bi pêşketinê de avêtine û hin bi hin cihê xwe di nav zimanên cîhanî de digire.

Dibe ku em ji asta ku zimanê kurdî îro gihiştîyê razî bin, lê ev tenê têrê nake, pêdivî bi kar û xebateke hîn zêdetir û xurtir di warê ziman de heye.

Gelek kurd hene hîn bi zimanê xwe naaxivin, yan jî nizanin pê binivîsin û bixwînin, ev bixwe pîrsgirêkeke pir mezin e. Di heman demê de gelek astengî û kêşe li pêşberî xebatên zimanî hene, yek ji wan nebûna zimanekî yekgirtî û stander di navbera hemû kurdan de ye.

Yekbûna zimanê kurdî ji hêla têgîn û rêzimanê ve mijareke pir girîng e, divê zimanzanên kurdî vê kêşeyê çarser bikin û bigihêjin lihevkerinekê ji bo ku zimanê kurdî baş rûne û metirsî li ser nemîne. Ev bixwe xebateke pîroz û erkeke netewî ye. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution

B A S K

Mihemed Almaxot



Werger: Imran Yûsiv

Dewlemend û belengaz, dadwer û tawanbar, pasevan, diz û serxweş, hemûyan ji min re got: Tu li vî welatî çi dikî, piştî ku porê te di bin ezmanê wî de spî bûye, û piştî te li ser rexreyên wî xûz bûye ? Tu li benda çi yî, piştî ku paşeroja te û ya xeynî te di siyaseta de hatiye destnîşankirin, wekî ku paşeroja Mihemed Emîn di hunerê de hate destnîşankirin? Derkeve welatên Xwedê yên fireh, dibe ku di siberojê de dem ji bo kirîna çenteyekî bi dest te nekeve. Û dibe ku ji bo rahiştina wî çentî tu destekî yan tilîyekê di destê xwe de nebînî. Di dawîya şevê de, her ku vedigerim malê, ez pasteportê, belgenîşana derketinê, deftera tenduristiyê, plêta firokeyê û hebên gêjbûnê li ser astana derî dibînim. Ez çentên xwe girê didim û diçim. Di çûnê de, ez dixwazim rûniştika min di odeya rêberiya firokeyê de be, li ser kaboka pîlot yan li ser kaboka keça mêvandar be, da ku di zûtirîn dem de ez dûrî vî welatî bikevim.

Û di vegerê de, dixwazim rûniştika min li pêşîya firokeyê, li ser qepaxa motorê wê be, da ku di zûtirîn dem de ez vegerim vî welatî.

Cara dawî, rêwingiya min li Tûnisê bû. çar hezar kîlometir di ser derya û parzemînan re, min di pencera firokeyê re dinerî, wekî ku kesê sêwî di cejnan de li navrûyên dikan û firoşgehan binere. Ewr ji Ereban revyayî bûn, pêl ji Ereban revyayî bûn, masî ji Ereban revyayî bûn, pîskirin ji Ereban revyayî bû, erebbûn ji Ereban revyayî bû. û piştî hefiyekê, min bazdida û ez li wan vedigeriyam, û kemera ewlehiyê hîn li bejna min girêdayî bû. Hevjîna min matmayî ji min pirsî: Çi bi vê zûbûnê tu vegerandî? Ma Tûnis ne bi dilê te bû ? Min got: Ew buhişt bi xwe bûye. Ro, derya û daristan. Wê got: Ji wilo zêdetir, tu çi dixwazî? Min got: Bi rastî, welatekî ku pîrsgirêk li tinebin, ez nikarim lê bijîm. Matmayî got: Pîrsgirêk ! Min got: Belê, Welatekî bêyî krîza xaniyan, krîza hatûçûnê, krîza xazê, û bêyî gotegotan .. ne filankes firiya û ne filankes çû, ez nikarim ji heftiyekê zêdetir lê rûnim. Her weha, bêyî tûtina qaçax, û pêlîkirina lingan di basan de, û berpîrsên

ku nîşanên trafîkê binpê dikin, û kamyonên ku di dema xewkurtê de hildikişin û dadikevin û şiyarên cemaweran di binyada avahîyekê yan şalêheke van berpirsan de dirijînin, û di her bolteneke nûçeyan de: Ey cemawerên gelê me, di vê qonaxa hestiyar ji dîroka milletê me de, ez hest pê nakim ku ez li welatê xwe me, di nav kesûkar û hezkiriyê xwe de me, wekî ku di gotinên xwe yên pêşwazîkirinê de dibêjin. Li Tûnisê, her tişt li cem wan hêmin û aram e, mîna navendên ezmûnan. Û her tişt li gorî sîstem û zagonê zelal û destnîşankirî ye. Lewra damarên min westiyar, û ez bûm mîna wî kendavîyê ku di hemû jiyana xwe de fêrî xewkirina li ber dengê basarkê bûye. Û çawa ew basark radiweste, di cih de ji xewê şiyar dibe û nema dikare cardin rakeve ta ew basark dîsa kar bike. Dûre, ez ji vî welatî hez dikim, ji oqyanosa wî ta bi kendava wî. ez li ku derê bim, çawa ez navê wî di rojnameyê de dixwînim, yan di radyoyê de dibihîzim, ez wek çemekî sîbîryayî sar dibim, dibim mîna zêrevanekî di hizûrgeha general de. ez jê hez dikim, rewşa min û hestên min berçav bigirin. Hevjîna min qîjiya : Pirsgirêka te ew e ku tu tinaziyê bi her tiştên vê deverê dikî. Vêcaminjêregot: Berovajîvêyekê, pirsgirêka min ew e ku ez rêzê ji her tiştê ku li wî ye re digirim, ta bi gemara wî jî. Govanê vî tiştî ew e ku gava dawîya şevê ez vedigeriyam malê, kîsekî gemarê bi ser min de ket, û min nerazîbûna xwe nîşan neda, ta min ew gemar ji ser serî û cilên xwe jî daneweşand, ji ber ji awaya ketina wê bi ser min de min nas kir ku ew gemareke piştgirtî ye. Wê got: Rewşa te pir metirsîdar e, divê tu xwe şanî bijîşkekî bikî. Min got: Doktor Kisincer wê pirsgirêka min çareser neke, bîne xeyala xwe jî ... di fîlmên Hesên Îmam de ez digirîm, û di ahengên Semîra Tewfîq de tiliyên xwe diqiriçînim. Wê got: Çendî min diêşîne dema ez helbestvanekî wek te dibînim, ku di dawîya temenê xwe de tiştek tinebe li ser biaxeve ji bilî Hesên Îmam û Semîra Tewfîq û kîsên gemarê. Ma te helbest jibîr kiriye?

Min got: Helbest ! Wekî tu zarokekî min ku min ew wînda kiriye diînî bîra min, û ez derekê jê re nas nekim. Wê got: Tu bi min bawer î ? Min got: Wekî ku ez ji Krayskî bawer im. Wê got: Dîtina te çî be jî, lê tu di rewşekê de ye ku dilê merov bi te dişewite ey kalemêrê biçûk. Dermanê te tenê helbest e, rêwingiya giyanî li ser baskên xewn û nîgaşê. Min got: Lê çawa ? û bi ku derê de ? Û ji ber ku hevjinê min bi sirûştîya xwe xewndar û nîgaşwer e, di cih de pencere vekir, li asoya dûr nerî û got: Aniha, ne sibe. Qerwelkên siyasî û astengiyên rojane ji serê xwe bavêje, û were ligel min, em li ser baskên xewn û nîgaşan bifirin, û ber bi cîhanên ku Romyo, Fîrlîn, Hanî, Şîler û Lorka berî me çûbûnê de herin. Bila em li cîhana efsûndarî û bedewiyê dûr bifirin, cihê ezmanê şîn, pêlên xewndar û daristanên qîz. Minjêregot: Dîlberamin, eger rewş li deverê bi vî awayî berdewam kir, sixêfkirin ji hev re , kongir û gotar. Di dawîya meselê de, ez û tu ber bi tu deran ji bilî Kamb Dîvidê ve nafirin.

Ji pirtûka (Ez ê xîzîziya welatê xwe bikim)

"Mihemed Almaxût helbestvan û wêjevanekî Sûrî ye, di sala 1934an dr li bajarê Selemîyê ji dayik bûye û di sala 2006an de koça dawî kiriye. Bi wêjeya xwe ya tinazî hate naskirin." ■

BINTARA GEŞPÊDANA MIROVAHIYÊ



Gulal Kasañî

Di pêşhatinê de em ê bi kurtayî li ser wateya Geşpêdana Mirovahiyê birawistin

Geşpêdan Çi ye? Ji ku hatiye? Di kîjan serdemê de bûye cihê nerîn û bikaranînê? Qonaxên ku di wê re derbas bûye.

Geşpêdana Mirovahiyê: Ew piroseya ku bijardeyên pêkan, zêde dike, ev mijar 3`ê bijardeyên sereke li xwe digire, ev in: 1-Peydakirina jiyanêke tenuristî ji mirovan re. 2-Belavkirina zaniyariyan. 3-Peydakirina hawirdên aboneyî bo ku kesayet di astake êgin de bijîn. Ev her 3`ê bijarde jî di rêya zêdebûna şarezayî û şiyandariya merovan de, pêkan in.

Welatê Amerîkayê dibe jêder û cihê afirandina Geşpêdana Mirovahiyê. Di wê hingê de û di bin akama stîla rojane ya mirovan de bi bandor bûye, bi wergirandina ziman re li çerxê 20`an xwiya bûye.

Geşpêdana Mirovan di gelek qonaxan re derbas bûye:

1-Qonaxa Piştî Cenga Cîhanî ya Duyem

Piştî bidawî bûne cenga cîhanî ya Duyem, welatên ku di cengê de şkestibûn, abûriya wan ket jêr destên talan û herifinê

de, amûrên jiyanê bi giştî mîna piran, nexwşxaneyan, dibistan û zangoyan û kargêr û pişkerên mezin hilweşîn, ji xwe xwediyê wan welatan dixwestin welatê xwe cardî bipêşxînin, di wê hindê de watenasiya Geşpêdana Mirovahiyê cihê xwe girt, bo ku di zûtirîn dem de piroseyên avakirinê, dirist bibin û cardî xweza geş bibe, jiyan mirovan hino hino normal bibe, insan ji bin bandora cengê rizgar bibe û hişmendiye şer û pevçûnan ji hole rakin.

Di vê qonaxê de watenasiya Geşpêdana Mirovan bi Geşpêdana Abûrî ve hate girêdan, ji ber avê çendê guhdana Zaniyar û ramanbîran bi aliyê xwendina Abûrî ve, kêşa. Ew jî bo encama zêdebûna Hilbera Netewî ya Tevayî, bo ku asta debara jiyanê û derameta kesan were hildan ta endamînin civakê bigihijin serxwebûneke abûrî .

Bîrdoziya Kilasîkî di wê demê de li ser destên zaniyarên navdar mîna Adim Simêz, Tomas Maltos û Rêkardo hate xwiyakirin ; bîrdoziya wan wisa dibêja:

Niştəcîh û sermîyanên aboneyan Du pêkanên sereke ne di Geşpêdana Abûrî de, her yek ji wan bandora xwe li ya din dike, her ku niştəcîh zêde dibin rewşa aboneyî jî ziyar digihêyê, ``ji ber wisa jî bîrdoziya Maltos bûye cihê rexneyê ji aliyê bîrdoziya Marksîya-Lênîn ve, dema ku digot şer û ceng dibin sedema kêmbûna niştəcîhan û ew jî dihêle sermîyanî bi rêjeyeke bilind bimîne``.

Salên 1960`î û 1950`î ji çarxa bîstan, bo ku cîhan ji tarîtiya wê jêrzemîna hiriftî ku ji sedema cenga Cîhanî ya Duyem çê bûye, der bikeve, karakterê Abûrî bandora xwe yekser li watenasiya Geşpêdana Mirovan

kir, lê di sala 1960`î de ne tenê guhpêdan bi geşpêdanê bûye lê belê balkêşan çûye ser cîbicîkirina hin ji girûpek siyasetên bizav ku kêmhajarî û danpêdana asta aboneya kesan, bide.

Ji wê demê ve, Netewên Yekbûyî rêbaza siyaseta geşpêdana mirovan ser milên xwe girt ku têkiliyan bi welatên hejar re bi hêz bike bo wan welatan ji wê rewşa hejarî û belengaziyê derxîne, mîna: Begiladêş, Pakistan, Xana û Kolombiya.

Li gor wê demê welatê me li ber pêlên hejariyê dimeşiya û ti danpêdan û pîlanên pêşketina mirovan; Ne jî ji aliyê welatên Dewletên Yekbûyî ve û ne jî ji aliyê hikûmetan ve ne hatiya cîbicîkirin. Welatê me, ji aliyê civakî ve di nav têkiliyên hoz û êlan de dijiya û dikûze, ji bilî serdestiya beg û axayan li cotkar û hejaran, ta li bajaran jî di aliyên jiyanê de gelek li paş ma bûye, çi ji aliyê

Rêveberiyê, Siyasî, perwerdehiyê û çande yî ve jî, çimkî ev aliyana hemû bi heve girdaneke diyaliktîkî heye bo ku piroseya geşpêdana kesan û ya civakê berovajî hev ne be .

Qonaxa piştî sala 1970`î :

Di vê qonaxê de bandora abûrî li ser geşpêdana Mirovan kêmbûye, pêre pêre bandora civakî xwe daye pêş û bandora xwe li ser geşpêdana civakî kirye, dema ku mirov li civaka Ewropîyan meyze dike, mat dimîne; ji aliyê gavênên mezin ku di aliyê civakî de avêt ne. Lê tevî wilo jî nehgihiştine wê astaya ku hêvî pê hebûn, ji ber ew ê çendê Netewên Yekbûyî xwest ku lêvegerekê û xwendineke nuh li ser geşpêdana mirovan saz bike, ji encamê giheştin ku divêt pîlanên abûrî xêr û xweşiyê ji mirovên civakê re peyda bike.■

Qamişlo- 5 - 5 -2021



FERHENGOK

Kulîn	مصطبة مرتفعة قليلا داخل المنزل لوضع المفروشات عليها
palûte	فزة و التعاون في انجاز عمل ما
Têrr	توضع على ظهر الحمار لحمل بعض الأثقال
Dangî	جمع الخراف مع أمهاتها من أجل الرضاعة
kozere	المواد المخلوطة مع القمح بعد الحصاد
guher	مكان جلوس الماشية
Havî	الحيوان الضال عن قطيعه
Mixêrîk	موقد النار يصنع في زاوية المنزل
Maltenûr	بيت صغير يحيط بالتنور من أجل حمايته
rêşî	عشب يتم تبييسه من أجل اطعام الماشية في الشتاء
beyar	المساجة الغير مزروعة
havl	المحصول
Paleyî	حصاد
Eşêf	ازالة الأعشاب الضارة من بين الزرع
piştî	حزمة تحمل على الظهر
destar	رحى
gundor	أداة لتسوية سطح البيوت الطينية
çirik	بكرة سحب حبل البئر
serrad	غربال خشن
miştax	العمل بين كروم العنب



حاورها: عمران يوسف

الشاعرة عبر دريعي:

«الغفوية حالة مدروسة شعريا، و لكل شاعر
أو شاعرة أسلوبها الخاص»

ولدت في حلب، درست الابتدائية و الإعدادية في مدارسها، انتقلت الى عامودا موطن العائلة، و تابعت دراستها الثانوية في قامشلو. هي أم لخمسة أولاد، و لاحقا أكملت دراستها العليا بكلية التربية، عملت اكثر من ثلاثين عاما في حقل التعليم، و تعمل حاليا مديرة مدرسة في عامودا، تأثرت بوالدها الراحل عبدالرحمن دريعي فنيا و أدبيا و بكل مناخ حياته و أسلوبه و تعاطيه مع الفن و الموسيقى و الشعر.

- لكل شاعر بدايات أغوته للخوض في بحور الشعر و جذبته نحو الكتابة .. ما الذي جعلكم تخوضون مغامرة الكتابة و ماذا تخبرينا عن تلك البدايات؟

كان الكتاب قريبا جدا مني، و آلات الموسيقى أيضا، و الألوان و الأقلام..

بحكم والدي الذي كان يشجعنا أنا و أخواتي على المطالعة و القراءة، قرأت كتبا كثيرة، جذبتني الكلمة و سحرتني فضاءات الكتابة، كنت امتلك أسلوب خطابة و صوت جميل، كنت اكتب خواطر و مقولات و جمل إنشائية .. لكن الانشغال بالدراسة و لاحقا اعباء تربية الأطفال و تعليمهم أخذ جل وقتي، و قبل سنوات قليلة توفر لدي كم كبير من الفراغ، و استطعت أن أملئ على الورق مشاعري وان ارسم حالات شعرية و انشر لاحقا ..

أعتقد أن الآن الراهن هو المحك وليست البدايات، فالبدايات قد انتهت مع البدايات، القادم هو المحك لي لإثبات نفسي ككاتبة و شاعرة لها مكانها في الفضاء الأدبي الإبداعي ..

- الشعر ماذا يعني لكم؟

الشعر هو ليس وسيلة و انما غاية، فالشعر حلم، و حصان بري .. ربما لا يستطيع الوصول اليه، هو الحقيقة كما قال ارسطو، وهو المطهر الروحي و المتنفس .. و رئة بكل ماتعني كلمة رئة للإنسان .

- المرأة و الشعر متشابهان و عندما تكون المرأة



رحلتكم في الكتابة؟

كان الإنشغال بأعباء الأسرة و تربية أبنائي رسالة حياتية لي، ربما ذلك الأمر لم يكن يسمح لي بالتقاط انفاسي و التفكير جدياً بممارسة الكتابة الشعرية، و لكن كانت الكتابة تستفزني و تتراكم الرغبة بدواخلي، وحين توفر لدي الوقت الكافي استطعت خلال سنوات كتابة العديد من المواد و النصوص،

لا أعتقد بوجود مصاعب حقيقية امام رغبة الكتابة .. و لعل أبرز المصاعب هي الاحساس بمراقبة الآخرين لنصوصك و محاكمتهم التي لا تعتمد على ممارسة النقد و انما اصطياد الأخطاء، او ممارسة دور المراقب الاخلاقي لصيغة و كيفية استخدام اللغة و خاصة فيما يتعلق بالتأبؤ المرتبط الى تفاصيل جسد المرأة، رغم انه جسد، و الكل يعلم بأنه ثمة هناك خاصرة او سرة او نهدي، ..

- أنتم إبنة عامودا مدينة الحرائق و المجانين و الأدباء .. ماذا تعني عامودا بالنسبة لكم و ماذا أضافت إلى تجربتكم الأدبية؟

عامودا مدينة كوردية أضافت لي الكثير على الصعيد الثقافي و الاجتماعي، فلي صداقات كثيرة و عميقة، مع شخصياتها الاجتماعية و الادبية و الفنية، و أحس ضمنها بالأمان رغم كل ظروف الحرب و الازمة السورية، و ذاكرة المدينة كمكان و تاريخ ساهم و بقدر كبير في تشكيل لغتي الشعرية، و كإمرأة افتخر بوجودي في عامودا، و انتمائي لها ..

حالة الجنون اضافة حقيقية لحكمة المدينة و فكرها و مكمل اساسي لمجتمعها المتألف و المتعاون، الذي يحاول كل واحد من جهته اضاء حالة المرح و الفرح كلغة مجابهة لحالات الألم و الوجد اليومي .

- ما هي مشاريعكم المستقبلية في المجال الأدبي؟

حاليا انا بصدد نشر كتابي الشعري الأول مع ترجمته للكردية و نشره ضمن كتاب واحد .

و اعادة طبع مجموعتي الشعرية التي صدرت ضمن مشروع الكتاب الالكتروني .

شاعرة يصبح للقصيدة نكهة أخرى .. ماذا تستطيع المرأة أن تضيف إلى الشعر؟

الشعر ليس كائن انثى، وهو ليس ذكراً أيضاً ..

الشعر حالة يمارسها الانسان في تفاعلاته مع الآخر مع نصفه الآخر، و جمال الشعر أو نكهته لا ينطلق من كون كان نتاج امرأة او رجل،

الابداع هو النكهة، وهو الاصل،

- في نصوصكم الكثير من العفوية و الصدق .. من أين ينبع كل ذلك؟

الشعر هو تمثيل حالة، فليس بالضرورة ان اكتب لأنني أنا، و إلا لكان الشعر تدوين لليوميات و لرواية سيرة ذاتية، الشعر له اتجاهاته و رؤاها و تخيلاته و صورته، كما له حالاته التي ليس من الضرورة تقاطعها مع سيرة حياة او لا ..

الصدق ضرورة، اما العفوية فلا اظنها تأتي هكذا عفواً الخاطر، و إنما هي حالة مدروسة شعرياً، و لكل شاعر او شاعرة أسلوبها الخاص .

- شاعرة كردية تكتب بالعربية، كيف تجدون العلاقة بين اللغة و الشعر و هل لديكم محاولات للكتابة باللغة الكردية؟

اللغة هو حامل الادب و هو حامل الكتابة، و بسبب عدم امتلاكي الجيد للغة الام كلغة كتابة، ابتعدت عنها قسراً نحو العربية، رغم ان اللغة وسيلة تفاهم و خاصة بعد سهولة وسائل الترجمة. فأنها غاية ايضاً، فكل ادب سحره التفاعلي مع لغته الام...

لدي محاولات خجولة على صعيد الكتابة الكردية، و مازلت اطور مهاراتي في ذلك الاتجاه .

- أين تنشرون نصوصكم و لماذا لم تقوموا حتى الآن بطباعة كتاب لكم؟

نشرت الكثير من الصحف و المجلات الورقية و الالكترونية. العديد من نصوصي و مقالاتي الشعرية و الادبية..

كما نشر لي مجموعة شعرية عبر مشروع الكتاب الالكتروني تحت عنوان «حينما كنت صغيرة» و انا الان بصدد نشر كتابي الشعري الجديد بأقرب وقت الذي سيتضمن نصوص لي خلال فترة الحرب السورية ...يعد الفيس بوك ابرز نوافذ للاطلالة على القراء، كما يعد مصدراً لقراءاتي الشعرية .

٧- ما هي الصعوبات و التحديات التي واجهتكم خلال

RONDIKA GERIM.. ŞÎN Û GIRÎ



Zahid Xelef

Ey nîgara ji reh û kevanên dilê min xwe hunandî.

Ey heyama ji kêlîkên jiyê min robar herikandî,
Ji bîr nabe bersiva te, ya ku cama dil derizandî,
Xemsariya te, xapînok û kenên te yî zer,
di riwê hezkirina min de,
hemberî jenandina dilê min î xav û hilgirtî,
sawêr in,
dû ne, nayên girtin û ne jî ji bîrdibin.

Wê şeva bûrî, hingî min bêriya te dikir,
Û tu bi destê min ne diketî,
Min di xewna xwe de, pencereke girtî dişkand,
Min wêneya te dipelixand û diqetan,
Min ew perçe perçe dikir, gelo heya te jê heye?

Wê şeva din,
Min gotinên te ji hev diwejartin, yoko yeko dijimartin,
tîpên li ser lêvên te ji hev divekirin,
Û ez ne digiham mebesta te,
Gelo bersiva te çiye?

–Havîn bû, min pişta xwe sipartibû
dîwarekî ji dîwarên Zorava, di çîqêna nîvro de,
di Meha abê de,
zehrê min ziwabûn; çavnihêrê piyalek ava sar bûm,
melûl û bêzar bûm, hêvî çilmisî bûm,
Di sergêjekekê de li xwe digeriyam

Wekî çawa Lawekî gundî, dil xav û dil şikestî,
Dakeve bajarekî çirisandî, hînî hezkirinê bibe
Min nema dizanîbû çawa û bi kûve herim,
Te riwê xwe diguherand, pişta xwe dida min,
Bi tenê pirtûka di destê min de bersiv bi min re parve dikirin,
Rûpelek ji rûpelên wê daxivî:
Kenê zer ji dilê ziwa ye, hezkirina bê rewya ye,
çîroka du dila ye,
Yek germ e kelê lêdaye, yê din li xwe ne ewle ye,
Sar e hîn refê xwe nediye, nasnekiriye.
Di navbera pêlên rewrewkê de winda ye.

Min ji xwe dipirsî:
ev çi dil e, sivik e bi ser riwê xwe de dikeve,
ev çi hêviyeke kor e, ji dêma te pêve nabije
xwe davêje bextekî lerizî û netebitî
û ne jî li kesî xwedî derdikeve,

kanîn qefdên gulê sor, kanîn şahî û mest,
kanîn şevbiwêrkên dirêj yên zivistanan,
Çawa rêçikên te ji yên min diveqetihan
di riwê hêviya min de digelicîn,
Ma ezê bi kûve biçim,
te hambêz ji min re venekir,

Ezêêêêê vegerim, vegerim, li xwe jî vegerim,
jiyaneke din ji tenehiyê li bejna Asoyan vegirim,
di sikakên gundê xwe de, mijûlî jîna ji xwe ve bibim,
li hilatina Rokê meyze bikim, çîrûska bişopînim
Û dema here ava, ez ê bigirîm, bikenim,
hêviyan bisipêrim,
bi Oxirê re birevim, da ku jibîr bikim,
Ey helbesta kelogirî, rondika germ şîn û girî. ■

HESEN ZÎREK (1921-1972)

Yek ji hunermendên kurd ên herî hêja, bejinbilind û navdar e.

Hesen Zîrek di sala 1921ê de li bajarê Bokanê yê rojhilatê Kurdistanê ji dayik dibe.

Zarotiyeke pir diwar û jiyankeke pir tal û nexweş derbas kir. Di zaroktiya wî de bavê wî mir û barê malbatê kete stuwê wî. Piştî dayika wî dizewice û Zîrek jî aware û derbider dibe. Ew di 8-9 saliya xwe de dest bi karkeriyê dike. Di temenê dazdeh saliya xwe de dîsa vedigere gundê xwe Hermêle, li ba xanan dibe mêter.


Piştî demekê cardî ji gund derdikeve, û li deverên Rojhilatê Kurdistanê gund bi gund digere. Diçe cem xanekî û dibe çekdarê wî. Ew wisa dike ku gel jê hez bike. Lê dema ku dibîne ev kar ne karekî çê ye û zîyanê digihîne gel, ew dest ji wî karî berdide. Piştî dibe şagirtê şofêr. Lê ji bextreşiya wî di navbera Seqiz û Baneyê de bi tirumpêlê li ciwanekî dide û ciwan dimire, Zîrek jî ji tirsan direve.

Vê carê berê xwe dide başûrê Kurdistanê û diçe bajarê Silêmaniyê. Paşê bajar bi bajar heta Bexdayê diçe û li wir li Meyxaneyekê kar dike. Ew hem dixebite û hem jî ji xwe re distrê û gel ji dengê wî hez dike û alîkariya wî dike.

Zîrek di sala 1953'yan de bi alîkariya Neşet Ebdurehman, Hemey Derwêş Kerîm, Selah û bi alîkariya Adil Îrfan li Beşa Kurdî ya Radyoya Bexdayê bi cih dibe û mehê bi şeş dînanan çar bernameyên sitranbêjiyê pêşkêş dike.

Pêncsalan li Radyoya Bexdayê beşa kurdî dixebite. Di sala 1958'an de Iraqê bi cih dihêle û vedigere bajarê Bokanê. Piştî demekê diçe Radyoya Mehabadê li beşa kurdî dixebite. Paşê jî wî dişînin Beşa Kurdî ya Radyoya Tehranê û ew li wir gelek berhemên hêja tomar dike. Zîrek li wir bi Mîdya Xanima Zendî re dizewice. Mîdya Xanim li ser vê yekê wiha dibêje: «Baş tê bîra min di sala 1958'an de dema ku ez li mala bavê xwe keç bûm, Zîrek hate mala me. Hê nû bernamaya kurdî hatibû damezirandin. Pêwîst bû ku di bernamayeke bi kurdî de jineke kurd jî qise bikira. Ez bi xwe kurd bûm û li Tehranê dijiyam. Ligel ku ez hê biçûk bûm û diçûm pola nehem, dîsa jî ez bi Zîrek re çûm radyoyê û bi vî awayî ew bû sedem ku min li wir dest bi kar kir. Piştî mehekê ez bi wî re zewicîm. Berhemên wê jiyanê du keç bûn. Sakar û Arezû. Piştî dawetê wan Zîrek şand Radyoya Kirmanşanê. Wî li wir gelek stranên kêmpayda û awazên hêja tomar kirin»

Hesen Zîrek di sala 1966'an de pirtûkeke bi navê «Çirîkey Kurdistan» dinivîse ku jiyan xwe vedihûne û şanzdeh stranên xwe jî tê de dinivîse. Ferîdûnê Muradî yê kirmanşanî notayên sitranên wî dinivîse û Dr. Mihemed Sidîqê Muftîzade jî pêşekê jê re



dinivîse. Ew pirtûk bi alîkariya Mîdya Xanima hevsera wî tê amadekirin û tê bilêvkirin.

Zîrek di sala 1967'an de diçe Silêmaniyê û bi armanca tomarkirina sitranan diçe Radyoya Bexdayê, lê sitranên wî tomar nakin. Ew tê girtin. Piştî şeş mehan wî teslîmî Îranê dikin. Piştî wê ji hevsera xwe Mîdya Xanima Zendî cuda dibe û zarokan jî dide wê.

Di havîna sala 1968'an de li nêzîkî bajarê Bane li 'Kanî Mela Ehmed' çayxaneyekê ava dike û dixebite. Di wê serdemê de bi hevsera xwe ya nû Rabîyê re dijî. Ew jiyankeke nexweş derbas dikin. Zîrek di kaseteke ku li Kanî Mela Ehmedê tomar kiriye de dibêje: «Ez li vir li ser çiyayekî dijîm, çimkî li Îran û Iraqê cihek tune ye ku ez lê bijîm. Di navbera çend keviran de, min çayxaneyekê nexweş heye. Eger hûn bîn û bibînin, hûnê ecêbmayî bimînin ku ez çawa li vir dijîm! Na, bi min xweş e û ez debara xwe pê dikim. Ji ber ku di nava gelê kurd de qedr û qîmeta hunerê nema, hunerê tu fêdeyek neda min. Hunerê ji min re tiştek nekir ku ez bi dû wê bikevim. Ji ber ku ez kurd im û bi zimanê kurdî qise dikim»

Ji ber hin sedeman Hesen Zîrek li Baneyê namîne û diçe Mehabadê. Li wir jî ji ber sedema sitrangotinê dibe hedefa êrîşa polîsan. Lewre bar dike û diçe Şinoyê. Birayê wî li ser wê rewşa wî wiha dibêje: «Ew nexweş bû, li Tewrêzê Dr.Yar Mihemedî ew emeliyat kir. Dr. ji me re negot, ji hevalên me re gotibû ku nexweşiya wî şêrpenceya kezebê ye. Piştî du mehan koça dawî kir»

Gora Hesen Zîrek li Bokanê ye.

Hesen Zîrek di roja 28 Hezîranê de (li gorî hin çavkaniyan ev dîrok 26 e û li gorî hinekan jî 24 e) sala 1972an de koça dawî kir. Di dema mirina wî de Mîdya û zarokên wî û Rabîe li bal bûne. Berî ku bimire ji pêşnimêjê Bokanê re gotibû ku gava ku ez mirim min li Çiyayê Nalesîkên veşêrin.

Li ser kêla li ser singê wî wiha dinivîse:

Zîrek zor kird xizmetî huner

Jînit le pê naw huner birde ser

Rojgarit satê be bêxem nebû

Belam le huner hîçit kem nebû ■

Jêder : Wikipedia

عالم المخدرات في الدراما السورية للعام 2021

بسام سفر



طالما كانت المخدرات والحشيش والهيدروئين والكوكائين والحبوب جزء من الموضوعات التي تركز عليها الدراما والسينما والرواية العربية في بناء عالمها الخاص بها لتشكيل معمارها العلائقي بين شخصها. وما تتركه من آثار خاصة في كل نوع من الإبداع الذي يستخدمها.

وعالم المخدرات واسع جداً وفسيح يستوعب قصص وحكايا وسرد خاص به وأدوات وأسماء خاصة غالباً تأخذ مجاًلاً خاصاً بها، فالاسم الخاص به في العمل الدرامي على صفيح ساخن» الحساس»، اعتمدا في دراما الموسم 2021 لنسج العديد من الحكايات الدرامية التي كانت جزءاً أساسياً من البناء الحكائي الدرامي للعديد من المسلسلات السورية منها» 2020، بعد عدة سنوات، على صفيح ساخن». واستخدمت السينما المصرية عالم الكيف في العديد من الأفلام أبرزها» حين يطير الدخان للزعيم عادل إمام، و» الكيف» للنجم الراحل محمود عبد العزيز.

فضاءها في» على صفيح ساخن»:

من أوسع الفضاءات الدرامية التي بناها الكاتبان الدراميان علي وجيه ويامن الحجلي في» على صفيح ساخن»، إذ نجد أنه أطلق عليها اسم جديد غير مستخدم «الحساس» وبني لها أماكن التصنيع والتوزيع ومراكزها وصراعاتها الخاصة، وواجهات مجتمعية تشكل غطاء لها.

أن هذا الخط الدرامي يشكل أكثر من ثلث العمل الدرامي من حيث التواجد والظهور، فعمل حلويات» المجرة» هو الجهة المصنعة والموزعة في أكثر من مكان، أولاً العمل مكان البيع، ثانياً جزء من شبكة ومقار التوزيع الثابتة الفندق الذي يعمل به» هلال، باسم ياخور»، والواجهة الاجتماعية المصونة وغير المشكوك بها الجمعية الدينية والاجتماعية التي تقدم من خلالها» نظلي الرواس، أم كرمو» مفاتيح حماية المجتمع من الخمرة والمنكر، وتعمل على تنظيف الرزق من المحرمات، فتحاول إغلاق وشراء كل المحلات التي تبيع المشروبات الروحية، وكذلك المطاعم التي تقدمها.

ومن البوابة العريضة يتم تسويق عملية الدخول إلى الأطر الاجتماعية المتعددة منها أسرة هلال، وأخته» هند، أمل أبو

شوشة» التي تتحجب نتيجة طلب» أم كرمو»، وتنزع الحجاب بطلب من» أبو كرمو، عبد المنعم عميري».

وعندما يفصح» أبو كفاح، محمد قنوع» شقيق أبو كرمو الذي أودعه السجن أسلوب من أساليب التوزيع، لكي يضرب عملية توزيع، لكي يضرب عملية التوزيع الحساس اليومي تتوقف عملية إدخال المادة في الحلويات التي تباع يومياً.

وتحفظ بأسلوب خاص في الفندق مثلها مثل» الفلوس»، في مكان خاص في خزائن الواجهة غير المباشرة، ولها قفل ومفتاح خاص. ويجري تعديل سعر المادة في الحلويات بشكل يومي حسب سعر السوق، ويدافع عن هذه الأسعار، وابتدع هلال أسلوب توزيع جديد مع عالم النباشين الذي يقود أهمهم» زهير الطاعون، سلوم حداد».

ويظهر الصراع بين الشقيقين» أبو كرمو» و» أبو كفاح» عندما يطلب محمد قنوع من أخيه أن يخرج من عالم الحساس مدة خمس سنوات، كما فعل به خلال سنوات سجنه، فيكون جواب أبو كرمو» خذ ما تريد من الفلوس وارك هذه القضية.

لكن رد أبو كفاح يكون في قتل» حازم، شادي الصفدي» الذراع اليميني لأبو كرمو في كل شيء. أن دخول المخدرات في الحلويات المصنعة تحتاج إلى استشارات طبية لكي لا تزيد في الجسم الإنساني، لذلك نجد هذا الأمر واضحاً عند» طاهر، زين خليل»، والطبيب المخبري الذي يحلل ويكشف نسبة المخدرات في الحلويات، وابتزازه لأبو كرمو بطلب» فلوس» مقابل عدم الإبلاغ عن ذلك، ومتابعة أبو كرمو لهذه العملية كلها. ذلك واسترجاع الفلوس عن طريق متابعة الموابيل وكشف مكانه. وعمل طاهر في وضع نسب محددة لوالده ليقف جزء كبير من تركيزه وانهيائه جسده لكي لا يستطيع المتابعة.

ويضاف إلى ذلك خط التغطية السياسي والواجهة في العالم السياسي المرتبط بمجلس الشعب الذي يقوده» عدنان أبو الشامات»، ويدخل أم كرمو إلى هذا العالم، ويعد عنه أبو كرمو بسبب حيازة أم كرمو على شهادة تخرج جامعية، وعدم أكال أبو كرمو دراسته، وبذلك لن يكون ممثلاً جيداً لهم في مجلس الشعب، بينما أم كرمو هي الشخصية المؤهلة لهذا الخيار.

بعد عدة سنوات :



عملية التهريب ودخول المخدرات تكون في مكان آخر، ويبقى خط المتابعة عند سماء ضابطة الشرطة التي متخفية بزي بائعة في محل إلى أن يجري اختطافها من قبل عصابة هي وقصي خولي، وليسجل فعل الاختطاف ضد عصابة مجهولة، بينما المختطف الحقيقي هو الشخصية التي أحبا قصي خولي.

تتابع عملية الصراع في العمل الدرامي إلى أن تقتل الضابط سماء قصي خولي الحبيب نتيجة الوفاء للواجب وانتقاماً لمقتل أخيها.

ملاحظات درامية:

في العمل الدرامي (2020) لا يجري التركيز العالي على عمليات تهريب المخدرات خصيصاً أن قصي خولي لا يتعاطى وإنما يتبرع بأموال المخدرات إلى دور الأيتام والجمعيات، ما هذا الفعل الإنساني المعتمد على أموال المخدرات، وهذه الفكرة هي لتسويق المخدرات في الدراما والحياة بعيداً عن مفهوم العقاب.

2- إن صحوات الضمير التي نجدها عند تجار المخدرات سواء من «هلال» في على صفيح ساخن والهروب خارج البلد والإبلاغ عن شبكة هي أيضاً فعل يبرر درامي، وتخرج الشخصية الصالحة بصحوة ضمير ولا تعاقب.

3- في بعد عدة سنوات الشخصية الفاسدة نورس تحمي من قبل الأخ جمال لتابع فسادها درامياً نتيجة قرابة الدم العائلة، بينما الاختلاف السياسي والفكرة يحل اجتماعياً بالتباعد ويدفع اليسار ثمن قرابة الدم والعائلة، في حين الأخ الفاسد يتمتع بهذه الحياة. ما هذه الانتهازية الحياتية والدرامية والسياسية في الإنتاج والتسويق الدرامي للفساد في العمل والحياة؟!

أخيراً تتساقط الدراما مع الوضع السوري الجديد حيث تقم العديد من المؤسسات الدولية أن سوريا أصبحت من أكبر المراكز المنتجة للمخدرات وإنها مركز انطلاق لتجارتها، وكشفت العديد من عمليات التهريب المنطلقة من الأرض السورية. ■

العمل الدرامي بعد عدة سنوات من تأليف بسام جنيد وإخراج عبد الغني بلاط فيه خط الدرامي يعتمد على الحشيش، وهذا يقوم به «نورس، سوار الحسن» ابن «أبو نورس، على كريم» ضد صديق أخيه «جمال، ميلاد يوسف»، ووالد «هليلين، رنا العظم»، «أبو زياد، أسامة السيد يوسف» وهو المعتقل السياسي السابق، والمفرج عنه من قبل الأمن، والذي يعود إلى عمله في ذات المؤسسة التي يعمل بها نورس، حينما يرغب جمال بإعادة الكتب إلى زياد يتبرع نورس بأنه سوف يقوم بهذه المهمة إلا أن أبو زياد يكون في زيارة لجمال، فيأخذ الكتب هو، ويكون نورس قد وضع كمية الحشيش في كيس الكتب، ومع وصول أبو زياد إلى بيته يدهم الأمن منزله ويأخذه بتهمة الاتجار بالحشيش ويجبر على الاعتراف على جمال فيتم اعتقال الشخصيتين بتهمة الاتجار والتعاطي بالحشيش.

لكن ما يلفت الانتباه إن الشخصيتين «جمال، وأبو زياد» هما شخصيتين يساريين، والخط الدرامي في العمل يقول بأن اختفاء أبو زياد من العمل حاجة درامية تحتاج إلى مبرر درامي، لكن المؤسسة العامة السورية للإنتاج التلفزيوني والإذاعي لن تقول إن هناك يساريين في سجون النظام السوري جاء اختراع الحشيش هذا احتمال، واحتمال آخر أن الكاتب بسام جنيد مع المخرج بلاط أوجادا هذا الحل الدرامي، لكن في الحقيقة إلصاق تهمة التجار وتعاطي الحشيش باليساريين والشيعيين بالعمل، هو خطأ وإجحاف بحق اليسار السوري التاريخي، فالأفضل كان اعتقالهم بتهمة سياسية نتيجة موقف سياسي واضح من النظام، إن هذا السياق خارج الإطار الدرامي الحقيقي، وإنما هو مفتعل ومبرر نتيجة رغبة (درامية- سياسية- إنتاجية) بغض النظر عن يقف ورأها خصيصاً أن شخصية جمال تفرغ سياسياً وفكرياً بعد خروجه من السجن، وتصبح شخصية درامية بعيدة عن الاتهامات اليسارية والسياسية.

: 2020

العمل الدرامي المشترك (2020)، من بطولة «سماء، نادين نسيب نجيم»، والنجم قصي خولي، ويقتل أخيها الضابط في بداية نتيجة مداهمة لبيت لعصابة تجار بالمخدرات، ما يجبرها على التطوع في «البوليس- الشرطة» لإنجاز عملية الانتقام له، والوصول إلى العصابة ورؤوسها الظاهرة والمختفية، وهذا يدفعها إلى التكرار بزي آخر غير ضابطة شرطة لتعمل في محل بيع الخضار الذي يملكه أهم شخصية في العصابة قصي خولي ومعه زوجة خاله وبعض الشخصيات الفاعلة في العصابة.

إن موقع محل بيع الخضار في حي من أحياء بيروت يجعل الاتجار قائم نتيجة التغطية التي يقوم بها على العاملين فيه بحيث يصبح التدخل عند الضرورة أسرع، وهذا ما نلاحظه في العديد من المشاهد والحلقات، ونتيجة وجود أجهزة مراقبة في المحل وأدراك ذلك من قبل العصابة تقوم بتقديم معلومات مضللة لرجال الشرطة ووضعهم على سكة وطريق آخر، بينما

وهناك أسباب تعود للأسرة منها الفقر المدقع وعدم اهتمام الأسرة بالتعليم وإجبار الطلاب على ترك المدرسة وكذلك

إجبار الفتيات على ترك المدرسة والمساعدة في أعمال المنزل، كذلك علميات النزوح للأسر من منطقة إلى أخرى في سوريا نتيجة الحرب والصراع السياسي والعسكري والاحتلال التركي لمناطق واسعة من سورية كما حدث في عفرين وسري كاني وكري سبي، ووجود منهجين للتعليم في شمال وشرق سورية وحيرة الأهل في اختيار مناهج الإدارة الذاتية أو مناهج السلطة السورية، وعدم الاعتراف الرسمي الدولي بالمناهج الإدارية الذاتية، كان هذا سببا في هجرة الكثير من أفراد الشعب إلى خارج الوطن من أجل مستقبل أطفالهم .

وهناك أسباب تعود إلى المدرسة ذاتها منها نفور الطلاب من المدرسة واستخدام العقاب النفسي والبدني والتميز بين الطلاب في المعاملة وعدم الاهتمام بالإرشاد النفسي والاجتماعي، عدم تقبل المناهج، عدم توفر المواصلات، هذه الأسباب الاقتصادية والاجتماعية والتربوية والصحية من أسباب التسرب من المدرسة فاهي الحلول للحد من هذه الظاهرة السلبية في المجتمع وكيفية المعالجة لإعادة الأطفال إلى مناهل العلم والتربية لتشكيل مجتمع واعي مثقف متحضر، وتم المعالجة من خلال توسيع انتشار مراكز محو الأمية للمتسربين وتوفير تعليم مهني مناسب لقدرات الطلاب وتأمين مراكز التدريب المهني، تطبيق إلزامية التعليم وجعله بشكل إجباري خاصة الأرياف لان النسبة الكبيرة موجودة هناك بسبب أعمال الزراعة والرعي .

وتطبيق مبدأ العدالة في التعامل بعدم التمييز بين التلاميذ، منع العقاب بكافة أنواعه في المدارس وتوفير تعليم علاجي للطلاب ذوي صعوبات التعلم كصعوبات النطق والخلل والإعاقة الجسدية.

التسرب المدرسي

واقع وحلول



رضوان محمد

التسرب من المدرسة ظاهرة غير صحية في جميع الدول، وتشكل خطرا حقيقيا على المجتمع من كافة المستويات الاقتصادية والاجتماعية والثقافية وحتى الأخلاقية، وتعتبر قبلة موقوتة جاهزة لانفجار في أي لحظة .

والتسرب المدرسي تعريفا هو انقطاع الطلاب عن الدراسة وعدم إتمام التعلم، نتيجة ظروف وعوامل عدة في سوريا خاصة بعد الحرب ونتيجة الدمار الهائل في البنية التحتية للمدارس والمعاهد والجامعات وتضاعف عدد التلاميذ المتسربين من التعلم، ومن أهم الأسباب لظاهرة التسرب المدرسي بشكل في سورية عام وفي شمال وشرق سورية بشكل خاص، أسباب تعود إلى الطالب نفسه منها عدم اهتمامه بالتعلم وصعوبات التعلم والزواج المبكر خاصة للفتيات والخروج إلى سوق العمل لمساعدة أسرته في ظل الظروف الاقتصادية القاهرة في سورية .



أيضا نشر الوعي وتثقيف الأسرة بقيمة التعليم ومساعدة الأسر الفقيرة ماديا لتغطية مصاريف التعليم وتفعيل التواصل بين الأسرة والمدرسة لمتابعة الأطفال .

إن جو البيت المريح للدراسة وتنمية شخصية الطالب وتركه حسب قدراته العقلية والمعرفية فليس بالضرورة أن يكون كل التلاميذ ذكّارة ومهندسين، وترك التلميذ حسب قدراته حتى تتشكل شخصيته المستقلة .

ولا يهرب من التعلم إلى الشارع حيث انتشار الجريمة، المخدرات، التطرف الديني، والانحراف، كل هذه التأثيرات السلبية سوف تلحق الأذى بالمجتمع وسيا الأمية وهي أخطرها ويعني ذلك عدم وجود وعي ثقافي في المستقبل، و نقص الكوادر التي تبني المجتمع.

وحاليا تتم المعالجة لظاهرة التسرب، من خلال المدارس المجتمعية أي إدراج قوى المجتمع المدني و مؤسساتها في عملية التربية والتعليم وخاصة في الريف حيث النسبة الكبيرة للتسرب، هذه المدارس تقضي على التسرب والتطرف الديني ، وتنشر أفكار التسامح وقبول الآخر والحوار، خاصة الحوار المجتمعي ونشر الوعي وعدم التعصب الفكري، من خلال التربية السليمة والتعلم.

كان هذا عرض مقتضب لمشكلة التسرب من التعليم للأطفال من المدرسة ومخاطرها الكبيرة، وأهم الحلول للوصول إلى مجتمع راقى قابل للتطور والتقدم، والوصول إلى مصاف الدول المتقدمة والمتحضرة، علميا وأخلاقيا وخلق بنية تحتية بشرية مؤهلة لمواكبة العصر وإزالة منابع الإرهاب الفكري وخاصة الإسلام الراديكالي التي تنشر العنف والدمار والتي باتت تشكل الخطر الهائل على المجتمعات وتسبب في انهيارها ونشر الفوضى. ■



BANDORA KÊMBARÎNA BARANÊ LI REWŞA ÇANDINIYÊ



Rapor: Efsan Kurdî

Li Rojavayê Kurdistanê ji ber ku îsal baran pir kêmbariya û zivistan bi ziwahî derbas bû, ev bû sedem ku piraniya zeviyên çandiniya hişk bûn.

Wek ku tê zanîn Rojavayê Kurdistanê %75 ji zeviyên çandiniyê bejî ne, û

nebûna baranê ziyaneke mezin gihande zevî û berhemên çandiniyê.

Li gorî hin pisporan, zêdetir ji 70% ji zeviyan li seranserî rojavayê kurdistanê hişk bûne û ziyan li cotkaran bûye.

Berhemên ku vê salê li rojava hatine çandin bêhtir ceh û genim in

kêmbê perçeyên kemûn, kizbera. reşreşk û hîlbê hatibûn çandin.

Cotkar dibêjin ku îsal parçeyên avî kêmbê in, tevî ku pirê erdan bîr di nav de hene, ew jî ji ber buhabûna çandiniya avî ye ji hêla sûtemeniyê. Semad û buhabûna yedekên motoran, ji ber vê yekê pirê zeviyan bejî bûn

Dilawer Hesên cotkarek ji bajarê amûdê ye ji kovara welat re axivî û got:

“Îsal, ji hêla çandiniyê ve ziyaneke mezin gihiştîye devera me. ji ber nebarîna baranê û ziwahiyê, debara jiyana xelkê me bi temamî li ser çandiniyê ye, ne tenê cotkar l belê xwediyên deraseyan û xwediyên pez û tevahiya vê xelkê ziyan gihiştê wan.”

Hesên diyar kir ku niha wan hemû zadên

xwe bi pereyîn pir kêmbê firotine xwediyên pez.

Dilawer banga xwe digihîne rêveberiya xweser û dibêje:

“Em bi hêvî ne ku rêberiya xweser di sala bê de alîkariyê bi me re bike, çi bi daxistina nîrxê tov û emadê be. Çi jî ziyana ku gihiştê me berçav bigirin.”

Derbarê heman mijarê de, Heysem Salih ku ew jî welatîyek ji bajarê amûdê ye ji kovara Welat re axivî û got:

“Karê min xwedîkirina pez e, mesrefa malbata min li ser vî pezî ye. Îsal ji ber ku baran baş nebariya ziyaneke mezin li me bûye. ji ber ev sal çêre çênebo û çandinî têkçû, berê nîrxê ceh pir buha bû û bi ser de îsal mûsim nehat, dibe ku nîrxê ceh bibe sê taq, niha em heyirî mane çawa van sewalan bi ên bikin.

Ji xwe niha ji bo çêrê em hin parçeyên zadê têkçûyî dikirin, lê ew jî nabe çareserî, em bi hêvî ne ku rêveberiya xweser rewşa me berçav bigire û alîkariya me bike, ceh û ên ji bo pezê me tabîn bike, ji ber xwedîkerên pez û sewalan pir in û pez û sewal jî samaneke neştîmanî ne.”

Hêjayî gotinê ye ku pêla zuhabûnê ya îsal bandoreke pir xerab li çandiniyê kiriye, lewra divê rêveberiya xweser çareseriyên lezgîn bibîne da ku krîza nebûna genim, ard û nan li deverê peyda nebe û krîzeke jiyânî ya din li krîzên heyî zêde nebe. ■





ŞÊLÛBÊLIYA ZIMANÊ KURDÎ DI ARMEYÊN DIKAN Û FIROŞGEHAN DE

Rapor: Kovara Welat

Ji bo zimanek li pêş bikeve û zindî bimîne, gereke ew ziman bibe pêdiviyeyeke jiyanî û di jiyana rojane de were bikar anîn.

Bi dehê salan zimanê kurdî ji hêla rêjîmên desthiladar li Sûriyê hatibû qedexekirin, û bi rengekî bîrdozî şerê wî dihate kirin, lewra rewşa vî zimanî di nav gel de pir lawaz bûbû.

Pitî damezirandina rêveberiya xweser li Rojavayê Kurdistanê hin biryarên giring di warê zimanê kurdî de hatin standin. Yek ji wan ku cara yekem perwerde û hînkirina bi zimanê kurdî li dibistanan û ji bo hemû qonaxên xwendinê hate destpêkirin. Her weha biryara nivîsandina armeyên li ser dikan û firoşgehan bi sê zimanan (erebî-kurdî- suryanî) jî hate derxistin.

Dema ev biryar hate derxistin, alavên cihbichkirina wê nehatin diyarkirin, lewra her xwediye dikanekê yan firoşgeheke ji ber xwe ve armaya xwe nivîsand, û hinan ji wan jî xwe spartin kesên ku bi zimanê kurdî zanin. Vê yekê şêlûbêliyê di ziman de peyda kir û ji dêvla ku bibe diyardeyeke şaristanî, ew bû bargiraniyek li ser ziman û dîmeneke nexweşik ji çavan re.

Hin têtînî li ser zimanê armeyan :

-90% ji xwediye dikan û firoşgehan pabendî bi vê biryarê nekirine û armaeyên wan tenê bi zimanê erebî ne.

-Gelek şasiyên nivîskî û rêzimanî di wan de hene.

-Têgînên ku tene bikar anîn di heman cureyê firoşgeh û dikanan de cuda û newekhev in.

-Di armayan de girîngiyê didin zimanê erebî , carcaran nivîsa bi zimanê kurdî nayê xuyakirin.

Netenê di armeyên dikan û firoşgehan de, ev şêlûbêlî tê dîtin, lêbelê di armeyê saziyên rêvebiriye de jî ev tê dîtin.

Îro roj nifşek bi zimanê kurdî tê perwerdekirin, lewra ji mafê wan e ku ev arme bi zimanekî zelal û xuya werin nivîsandin.

Divê rêveberiya xweser li ser vê diyardeyê raweste û van şasiyan sererast bike, ev yek ji awayên parastina ziman e. ■

LORÎ



ŞAMA

Lorî lorî
Bexê min lorî
Tu ranazî bê lorîk
Di dergûşa xemilandî
Bi tûl û morîk
Çûkê min î bê perîk
Lorî lorî
Bexê min lorî
Li Şengalê kuştin ciwan
Serî jêkirin, eman
Keç û bûk revandin
Firotin li sûk û meydan
Lorî lorî
Bexê min lorî
Li Efrînê weşandin zeytûn
Kuştin mêr û xatûn
Di xwînê de hiştin perî
Qet kirin xezal û zerî
Lorî lorî
Bexê min lorî
Li Kobanê komkujî
Firandin serî û mejî
Arîn bû volkan
Bi hêz û vînê
Dijmin kir dûman
Bo serxwebûna insan
Lorî lorî
Bexê min lorî
Li Rojhilat daleqandin Ramîn
Xortê leheng şêrîn
Bê azadî nabe jîn
Dayikê bang kir
Ax lorî lorî

Bexê min lorî
Li Botanê serhildan
Nisêbînê berxwedan
Girtin rojname, weşanxan e
Bombedaran kirin goristan
Megrî megirî
Bexê min lorî
Waşûkanî helbesta xemgîn
Hawar! zarok şewitîn
Xaka bav û kalan
Di can de vebûn birîn
Lorî lorî
Bexê min lorî
Ciwanên Qamişlo destek
dan
Li cebhe, bajar û gundan
Xwîn rijandin bûn
pakrewan
Wek çûkan firyan ezman
Dayik nema dibêjin
Lorî lorî
Bexê min lorî ■



نصوص شعرية



مروان شيخي

شيء ما
يجعلني ابتسم رغم كل هذا الحطام
.....

كانت تجلس
قرب النافذة كل ليلة
ترتدي فستاناً أبيض
تنتظر كي يرمي إليها
زهرة قرنفل ويمضي ..
ما زالت تنتظر ..
لا يزال يأتي
مرتدياً بدلة عسكرية
ويحمل بيده بندقية ...
ناسياً زهرة القرنفل ..



ثمّة بابٍ مُتعبٍ
يُحدّق في كل المآرة
يوقفهم بيأسٍ
ليَسألَهُم عنكَ
.....

في الليل
يتوقّف كل شيءٍ
عن الحركة إلا قلبي
يصرُّ أن يعزف لكِ
طبّول الحنين
.....

لا ظلّ للثّار
سوى نار قلبي
الذي يُلْسَع أصابعي كلّما تذكّرتكِ
.....

حفظتُ كل كلامكِ
سوى
تلك البسمة ..
كيف كنتِ ترسمينها على شفّتيكِ ؟ ..
.....

كنتُ وحيداً
خارج السّطر والصّدر
اتلوى من انحناء يدَيْكِ
.....
فلتأتِ يا حزنُ
على شكل امرأةٍ
تهوى الليل مثلي
وتفكّ جدائل فرحي شعرة .. شعرة
.....

ŞÊLÛBÊLIYA
ZIMANÊ KURDÎ DI
ARMEYÊN DIKAN Û
FIROŞGEHAN DE

فضائيات عادل موزع معتمد لشبكة سكاي
شبكة سكاي
البيت الرقمي
أروع تجربة
FULL HD
اشترك هنا

رياضة. افلام
ترفيه. دراما

0932941308
0938100789

فضائيات عادل
Setlayî Adîl

بيع وتركيب وتحديث وصيانة جميع أنواع الدشات
في كركوك وكربلا
0932941308

STARCOM World Of Satellite Receivers
NIC



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

